Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

Çirya Paşîn / 15 - 11 - 2021 Kurdistan-Hejmar (209) www.pdk-s.com

# Rewşa abûriya xerab û leşkeriya neçar dihêle xelkê me koçber bibin

Kurdistan Fener Omer



**Di dema dawî de hejmareke zêde ya ciwanên Kurdistana Sûriyê koçberî welatên Ewropa bûne, hin ji wan jî li ser sînorê Belarus û Polenda asê mane, hin jî li Bulgarya ne di rewşeke gelekî zehmet de dijîn, Rojnameya Kurdistan li ser sedemên vê koçberiyê ji hin welatiyan pirsî. Ebdulqadir Mihemed wiha dibêje, di dema dawî gelek ciwanên me berê xwe dabe rêyên koçberiyê, ji ber ne kar heye û PYD bi zorê wan dibe leşkeriya neçar, herwiha rêveberiya vê partiyê her tişt buha kiriye wek nan û sotemenî, jibilî fişarên din.**

**Silava jî li ser vê mijarêwiha dibêje, ciwan li welatê me nema ne, niha di rêya Tirkiyê diçin bêyî ku ti aliyek wan vegerîne, Tirkiyê jî dixwaze ciwanên Kurd li vê deverê nemînin, ev jî siyseteke ji aliyê Tirkiyê vet ê meşandin û PYD jî rê li pêş vê yekê xweş dike. Divê PYD kiryarên xwe derheqê xelkê me rawestîne, wek nehiştina leşkeriya neçar li deverên Kurdî, erzankirina kelûpelan û sotemeniyê.**

# Emerîka soza nehiştina astengiyên li pêş danûstandinan daye




Kurdistan-
Jiyan Ebdulqadir

Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) radigihîne, Cîgirê Nûnerê Amerîka yê Taybet bo Sûriyê David Brownstein diyar kiriye ku tîma dîplomasî ya Amerîkî dê di demeke nêzîk de vegere herêmê. Desteya Serokatiya ENKSê di daxuyaniyekê de ragihand, “Li ser daxwaza Balyozê Amerîkî David Brownstein, roja 9ê Mijdarê hevdîtinek di navbera wî û Serokatiya Encûmena Niştimanî ya Kurd li Sûriyê (ENKS) de bi awayê “online” hate kirin.” Li gor daxuyaniya Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê ENKSê, di civînê de hejmarek mijarên giring hatin guftûgokirin û aliyê Amerîkî tekezî li ser berdewamiya hebûna Amerîka ya leşkerî li bakurê rojhilatê Sûriyê kir, ji bo rêgirtina li vegera DAIŞê, dabînkirina aramiyê li herêmê û piştgiriya çareseriya siyasî li Sûriyê li gorî biryarên navdewletî. Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê diyar kir jî, Brownstein tekezî li ser pabendbûna welatê xwe bi serperiştîkirina danûstandinên di navbera ENKS û Partiyên Yekîtiya Niştimanî ya Kurdî (PYNK) de kir. ENKSê her di wê derbarê de diyar kir jî: “Brownstein pabendbûna welatê xwe bi belgeya garantiyê ya ku bi serkirdeyê HSDê Mezlûm Ebdî re îmze kiriye û bicihanîna naveroka wê û piştre rûniştina li ser maseya danûstandinan kir.” Destnîşan kir jî, di civînê de li ser binpêkirinên li dijî ENKSê, girtina endamên wê, gefên berdewam li ser malbatên Pêşmergeyên Roj û girtina deriyê Sêmalka di rûyê serkirde û endamên ENKSê de hat rawestandin û Balyozê Amerîkî soz da hemû van mijaran bi serkirdayetiya HSDê re gotûbêj û çareser bike. Di daxuyaniyê de hat gotin: “Balyozê Amerîkî diyar kir jî, di demeke nêzîk de tîma dîplomasî ya Amerîkî dê vegere navçeyê û dê kar ji bo nehiştina wan astengiyên li pêşiya danûstandinên Kurdî hene, bike.” Ji aliyê xwe ve, Serokatiya ENKSê spasiya Amerîka ji ber parastina ewlehî û aramiyê li navçeyê û nehiştina her destêwerdaneke derveyî kir. Li ser mijara yekrêziya nava aliyên Kurdî li Kurdistana Sûriyê, Mihemed Ebdula wiha dibêje, heger aliyên Kurdî di dema niha de nebin yek dê hemû deverên me bikevin jêr destê grûpên çekdar û dê ev yek karesateke mirovî li pey xwe ve bîne, em hemû dizanin ku destêwerdanên rasterast yên PKK di nava karûbarê Kurdistana Sûriyê de bûye pirsgirêkeke mezin ji bo Kurdên Kurdistana Sûriyê û çarenivîsa wan, divê Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê vê mijarê di zûtirîn dem de çareser bike berya ku PKK deverên me radestî Tirkiyê yan rejîma Sûriyê bike û niha ew kar li ser vê yekê jî dike. PKK ji dahatên Kurdistana Sûriyê sûdmend e lewma ew naxwaze rêkeftin ligel ENKS were kirin ji ber ku dê zirarê bighîne berjewendiyên wê û dê hemû pilanên wê jî eşkere bibin Ev partî bûye bela li ser serê Kurdên Sûriyê, û endamên wê hincetên didin Tirkitê ku derbasbî deverên me bibe û guhertina demokgrafî bi rêya grûpên çekda re li deverên me encam bide. Me hemûyan dît bê li Efrînê çi rêkeftin hatibû kirin û bi şerekî duristkirî hatibû radestkirin. Can Xalid jî wiha dibêje, Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê pêngavên wê di vê derbarê de rast û eşkere ne, û her kes ew dizane çi dike, lê pirsgirêka mezin ku PKK bi tena serê xwe derbarê çarenivîsa miletekî kar dike û rêkeftinên nehênî ligel Rûsiya hem rejîma Esed hem istixbarata Tirkiyê û dê ev yek zirareke mezin bighêne Kurdên Kurdistana Sûriyê, lewma divê rêgirî li vê partiyê were kirin heta ku ti rêkeftina li ser hesaba xwîna gelê me ne.

# PDK-S:
# Her ku diçe çareseriya siyasî li Sûriyê aloztir dibe



Kurdistan

Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya PDK-S raporta xwe ya siyasî ya meha Çirya Pêşîn belav kir.
Mekteba Siyasî ya Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya PDK-S wiha di raporta xwe de dibêje "Çareseriya siyasî ji ji kirîza Sûriyê li gir biryara navdewletî 2254 bûye pirsgirêkeke zehmet, Komîteya Destûr di gera şeşemîn de wê jî ti pêşketin bidest nexistiye, tevî ku karekî zêde ji aliyê Şanderê Navdewletî ji bo Sûriyê Geir Pedersen jêre hatibû kirin, tê wê wateyê ku biser neket, û ev yek dê nehêle danûstandinên biçe qonaxên din, û bi vê yekê çareseriya siyasî li Sûriyê dê were paşxistin û girêdayi rêkeftina navdewletî ye".
Derbarê gefên Tirkiyê bi encamdana operasyoneke serbazî li çend deverên Sûriyê Mekteba Siyasî ya PDK-S di raporta xwe de wiha dibêje"Tikriyê di gefên xwe de ji bo ser çend deverên Sûriyê ranewestyaye, bi hinceta ewlekariya wê û bi armanca xistina fişarê ser HSD û MSD û PYD ku berê xwe bide rejîma Esed, û niha ew yek tê kirin bi serperiştiya Rûsyayê, tevî ku heta niha bê encamp e, lê niha tedbîrên radestkirin û xweradestkirinê berdewam in, û tenê ev yek jî ji bo xweparastine ji her êrîşeke Tirkiyê ji berk u rêkeftina Emerêka ligel Hêzên Sûriya Demokrat tenê ji bo şerê rêxistian DAIŞê ye, û ne ji bo berevaniya siaysî ye, yan dirustkirina sîwanekê ji bo parsatian wê. Rûsiya jî ligel Tirkiyê ye di vê derbarê de ji bo pêkanîna berjewendiyên herdu aliyan, berjewendiya Tirkiyê tinekirina HSD ye lis er sînorên xwe, ya Rûsiya jî xurtkirina pêwendiyên ligel Tikriyê ye û bihêzkirina rejîma Sûriyê ye ji bo kontrolkirina tevahiya xaka di destê HSD di jêr navê yekperçeya xaka Sûriyê û parastina serweriya Sûriyê, gelo wê Tikriyê li vê derê raweste , ev yek girêdayî pêşhatên pêşerojê ne.Rejîma Sûriyê jî ne amade ye ji bo danûstandinan ji bo dana mafan ji bo her pêkhateyekê, û ne ji bo opozîsyonê ji berk u çend caran ragehand ku ti doz bi navê doza Kurdî nîne, û tenê daxwazên çandî hene. Niha rejîma Esed berê xwe daye sîstema nenavendiya îdarî di rêya cîbicîkirina yasaya rêveberiya xwecihî, ew di dixwaze di vê demê de careke din vegerîne bi awayekî demkî yan ji bo çend qonaxan ji berk u Rûsiya piştevaniay wî dike, û dixwaze pêwendiyên xwe ligel çend welatên Erebî normal bike û vegere nava Komkara Erebî, rejîm dixwaze rewşa xwe vegerîne li ser asta navxwe û siyasî û navdewletî û herêmî.
Li ser hebûna Emerîka li Sûriyê, Mekteba Siyasî wiha dibêje, Emerîka dixwaze li Sûriyê bimîne, û bi taybet li rojhilatê Feratê ji ber berjewedniyên siaysî û abûrî, herwiha hemahengiya wê ligel Tirkiyê û Rûsiya û Israîl, herwiha derbarê hebûna Îranê li ser xaka Sûriyê û metirsiya vê hebûnê hiştiye ku Emerîka ne tenê piştevaniya HSD di şerê dijî terorê û DAIŞê de bike , belku rijd e li ser berdewamiya serperiştiya danûstandinên Kurdî, tevî binpêkirinên berdewam yên grûpên çekdar yên ser bi PYD ve . Îran tevî rewşa abûriya wê ya xerab û siyaseta şikestî ya derve û pirsa rêkeftina Etomî ligel Emerîka û welatên Ewropa, destêwerdanên wê di welatên wek Sûriyê, Yemen, Îraq û Libnanê de berdewam in, wek piştevaniya Hizbulaha Libnanê û desteserkirina biryara wî welatî. Herwiha aloziyên wê yên vê dawiyê ligel Ezerbeycanê, dibe ku ev nakokî bighên ligel Tirkiyê û piştre Evxanistanê, ev hemû jî xizmeta pêşketina Îranê û pêşeroja wê nake, ev yek tê wê wateyê ku asoyên siyasetê di dema niha de ne ji berjewendiya Îranê ye heger li ser siyaseta xwe berdewam be.
Derbarê Herêma Kurdistanê û Îraqê mekteba Siaysî wiha dibêje, heta niha li Îraqê karvedanên encamên hilbijartinan berdewam in û nerazîbûnên aliyên girêdayî Îranê berdewam in ku kursiyên kêm di van hilbijartinan de bidestxistine.Li Herêma Kurdistanê, serkirdayetiya Herêma Kurdistanê dixwaze lihevhatinê di navbera tevahiya aliyên siaysî yên Kurdistanê û pêkhateyan de dirust bike ji bo avakirina kutleyeke mezin li ser çend pransîpan ji bo xizmetkirina gelê Kurdistanê û Partiya Demokrata Kurdistanê bi rola sereke di vê derbarê de rabûye.

# Em hemî Pêşmerge ne



Emel Hesen



Bê guman dema ku em dibêjin em hemî pêşmerge ne, tê wê wateyê ku gelek tişit divê mejarêde hene,piwîte ku ji me tê xwestin ku em bidin xwyîyakirin, ji bo çi em dibêjin em hemî pêşmerge ne,tevlî ku dinerînin gelkande ku pêşmerge tenê ewin yîn ku îro Çek li milên wane, di çeperîn berxwdanên de amede ne, berevaniya xaka Kurdistana pîroz dekin, lê?! dem ku em debêjin em hemî pêşmerge ne, ev wate tê gihurtin helbet devê ew nerîn û raman jî werin guhirtin di hişên Mirovan de em karibin li wan bidin zanîn û zeala bikin vê wateyê di mejeyîn wan de bervirehbikin em karbin ku wan razîbikin,ji bo viyana wan bi hêz bibe bivê hevoka qedirgeran, çawa wê karibin bivî barî rabin û Mafê xwe biparêzin, xwe beghînin astên herî belend û serfiraz bêyî ku Çek li melên wan bin . Xweşik û birayênrên rêzdar û neştîmaperwer gotina Pêşmerge xoştirîn gotine hatiye di jiyanê de, ji ber vê yekê ew peyev hatiye bikaranîn li hemî qûnaxên Jiyanê de û her weha li hemî devran û waran de,rola wê heye bicengevanî û dilovaniya Mirovatî rola xwe deleyeze ji bo roleka xwe ya mezin heye ev gotin .....di hemî mejaran de tê bikaranîn û Mînakên wê jî pirin ..emê yek bi yek van Mînakan bînin li ser ziman bixêzên bedew darve bikin her wisa bişopînin û şirovebikin,

Xala yekemîn:Em ê rasterast qala Dayik û Bav bikin her weha em ê bidin xweyakirin ji bo çi me yekser got dayik û bav , ji ber ku dayik ew kesa ku Leşker bi hêza Xwedê di zikê xwe û nav hinavê xwe de hilgertiye, jiyan xwe xiste qedexê de ji bo ku ew pêşmerge hebît ..helbet Bav jî roleka weya mezin devê jînê de heye, piştî ku dayik wî zaroka piçok têne li ser rûyê vê duniyaye ew bavê hêja bişev û roj kar deke mil bimelê Xêzana xwe re dîwarên pêşerrojê avadikin, ji bo karibin zrokên xwe mezin bikin bighînin astên herî belend, ji bo Melet û Welat bi wan şanz û serbilend bin , bi vî awayî hat zanîn û xuyakirin ku dayik û bav ...pêşmergên herî mezinin ewin,ji ber vê yekê serî li ber rûmet û rêzgertinên digrin.

Xala duyemîn: Em ê qala jîna karker û kedkaran bikin, ku ji wan pêk tê ku tenê hêza wan a kar heye û girîngiya hebûna wan di civakê de ji her deveran û warên jiyanê, çi karker, Cotkar, Hesinkar, Husta, Crdevan, Çavdêr , Qeraş, Nanpêj, Berber, Rêncber, û hwd. Hêza wan ji xebata wan e û ew di berdêla dema xebata xwe de mûçeyên xwe digirin. Ger çîna karker tunebûya, welatê me di wê bedewiyê de nedibû, ji ber ku netewe bi dest û terê çenga wan karkeran.Ji bo westîn û hejariya wan qedir û qîmetek mezin heye.Pêwîst e ku em wan pîroz bikin û ji wan re bêjin ku hûn di her wateya peyvê de Pêşmergeyên kedkarin

Xala sêyemîn: Ew têkildarî zanist û çand û pêşengên wan e, wek nivîskar, helbestvan, hunermend, derhêner û şanoger, û hemî yên ku hatine behs kirin di jiyanê de xwediyê taybetmendiyên baş in, û ew bi pênûsa xwe rola xwe dilîzin , raman û xebatan, û ji bo wê, me navên wan bi mirovan da nas kirin. Bi felsefeya raman, çand û hunera avakirina civakek dewlemend ku pê re çand û huner bimîne, û di pêşkeftin û berfirehkirina helwestên edebî de ezmûna wan heye, û ji bo vê yekê, her kes hewcedarê wan e, û ev hemî diyar dike ku ew jî bi helbest, nivîs, stran, nîgar û karên xweyên afirîner ên xwe pêşmerge ne

Xala çaremîn: Em ê girîngiya zanist, zanyar, xwendekarên hêja, mezûnên zanîngehê û enstîtûyên teknolojiyê, siyasetmedar û akademîsyenên wekî Bijîjk, Endezyar, Dîrokzan, Parêzer, Mamoste, Rojnamevan û Medya giftgu bikin. Civat bi gelemperî hewce dike wan û welat. Ji ber ku ew bi ramanên xweyên armancdar gel û neteweya Kurd ava dikin, û çanda wan di nûjenkirina raman û pêşxistina civakê de biserdikeve. Welat hewceyê wan e, û ezmûna wan têrê dike, û ew çi ji destê wan tê dikin ku welatek dewlemend bi hêviyên zanînê ava bikin û ronakbîrî, ji ber ku ew bi hemî dilpakî ji welat, welatî û dozê re xizmetê dikin.Heger ew ne ji pêşmergeyê çekê rastîn bûn, ew ê bi hemî behre, zanîn û siyaseta xwe ji Pêşmerge fam bikin.

Ez bawerim ku me mijar derbarê vê yekê de zelal kir: Çima em dibêjin (em hemî pêşmerge ne) ango Dê, Bav, Bira, Xwişk, Zarok, Keç, Kur, Pîr, Kal, Xwendekar û Karker, û hetta Ax, Av, Deşt, Çiya,Zozan ... hwd. Ev hemî pêşmerge ne, û hezar silav tijî welatparêzî ne, ku em pêşîn pêşkêşî hêzên pêşmerge dikin. Ji ber ku ew leşkerên netewe û bînahiya çavên Kurdan in, û çavên şiyar û parêzvanên welat in, dûv re silav ji her kes an kesê ku erkê xwe li hember welatê xwe dike û wekî pêşmerge xizmeta gel û doza wan dike. Her bijî serbilind, Kurdistana azad, û bijî Pêşmerge Bijî Pêşmerge, û bijî Pêşmergeyê yekem, serok Mesûd Barzanî, û malbata Barzanî nemir şêrên azadiyê û peyamnêrên evîn û ahengê ne.

## Selah Resûl xizmeta hunera Kurdî kiriye

Kurdistan-Bidûvçûn

Selah Resûl 27ê meha derbasbûyî, li nexweşxaneyeke bajarê Essen a li Elmanya, ji ber nexweşiyê, di 69 saliya xwe de koça dawî kiribû.
Selah Resûl, li Kurdistana Sûriyê hunermnedekî naskirî ye, sala 1952 de ji dayîk bûbû, sala 1966 dest bi gotina stranan kiribû.
Hunermend Selah Resûl bi stranên xwe yên dawetan gelek navdar bû. Di salên 90yan de koçberî Almanya bûbû.
Hunermend Selah Resûl pirtûkxaneya hunerî ya kurdî, bi gelek stran û awazên xwe dewlemend kir û nêzîkî 45 kasetan weşandibû.

